

## Dîsa Newroz Mêvan Û Pîroz e

Enehîta Mûrad

Weke hersal va ye heyva Avdarê, nîşana Buhara rengîn, bi bîanîn û boneyên xwe ve, wê dîsan weke hercar, li me bibe mêvan. Miletê Kurd,, bi çûk û mezinên xwe ve, bi xem –qisawet, hêvî û pêjnên xwe bilind bilind, ber ve jor geş bike.

Belkî îsal cejnên Avdarê, bê jan û êş biborin. Wê Çi bibe, eger pêlin hênik ji bayê azadî û hêmenî li ser rûyê miletê Kurd, yê reben û roj nedîtî, li wê Sûriya me ya şêrîn bilîsta. Zarok û ciwanên me jî, mîna xelkê cîhanê yên serdest wergirtine, bi cejnên xwe şabibana!

Ma gelo! Ev rêjîm ya li ser têxt palvedaye, çima li xwe napirse, ji berî dewran lê bizîvire û sûdê ji derdora xwe nagre. Hêjî, ewe di çavsorî û rikgiriya xwe de, li serê xwe siwar e. Pir rengên zordariyê li me dike. Wisan jî girtiyên 2009 an li bajarê Helebê, ta roja îro, ew bê sûc û guneh di binê hebis û zîندان de mane. Yek gunehê wan ew bû, tenê ew Kurd in û hew.

Ta kîngê emê weha li benda heyameke demokratîk, wekhevî û aştiyê bibînin. Ta kîngê zar û zîçin me, wê di heyama biv, tirs û qedexkirinê de mezin bibin.

Erê ev bêbextiyên cavsoran , li vir- Sûriyê – li me dibe, her û her weha namîne, û çawa wê hertim wisan bimîne. Bêguman wê rojek bê , û bi ya me be ev roj nîzîke ne dûr e.

Pêdarî û vîna gelê me yê Kurd, bi gavine pîvayî li gel xebata basikên Tevgera niştiman perwer a Kurd û refên danezana Şamê , wê li rojên mandê cih bigre. Heyama cîhanê berve hevjiîneke demokrasî, wekhevî bi azadî û aştiyane pejiwandina mafên mirovan diçe.

Erê... Erê xwendevanê me , ma kî nizane , Ku ev gelê me yê Kurd , hemû rengên çewandinê lê bûne û dibin, wê di rojên bê de, di duhatiyêke pir nêzîk de , ev zordarî weke lekeyeke bi tu sabûn û avan nayê şuştin, li ser eniya zorkeran hertim ji nûguhayan re diyar û xuyan bike, û neviyên zorker û dagîkerên xaka me, wê çî û çiqas bi şerim û fehîtiyêke bê hempa li ser rû û rûpelên bav û kalên wan bi aşkere xuyan bike .



## PÎROZ BE

**Bi boneya cejnên Avdarê ( 8-21 ), desteya birêvebiriya NEWROZÊ, gelê Kurd bi jin , mêr , kal , pîr û zarokan ve pîroz dike , her weha jiyanêke xweş û geş tijî azadî û aşti ji wan re hêvî dike**